# Kurdistan

PDK-S 1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Adar / 1 - 3 - 2021 Kurdistan-Hejmar (192) www.pdk-s.com


# Çima rewşa korona li Kurdistana Sûriyê nayê eşkere kirin

Kurdistan **Aram Ehmed**




Ev demeke li Kurdistana Sûriyê behsa amarên korona nayê kirin, û heger hejmar tê belav kirin jî hejmar kêm têne xuyakirin. Lê rêjeya mirinê her zêde ye. Lê niha bi hatina core nû yê korona dê rewş çawa be gelo, û çima dezgehên tenduristiyên yên ser bi PYD ve vê yekê behs nakin. Welatiyê bi navê Ehmed Elî wiha dibêje, divê hemû amarên rasteqîne ji xelkê re were eşkere kirin û ji xelkê neyê veşartin heta ku parastina xwe bikin, bi rastî corê nû yê korona gelekî zû belav dibe û dê bibe sedema zêdebûna haletan. Emar jî dibêje divê dezgehên tenduristiyê xwe ji şepêla nû re amade bikin û kombûn werin qedexekirin, divê biryarên nû bêne derxistin ku di berjewedniya welatiyan de be û nebin rêgir li ber karên wan, divê welatî pabendî rênmayan bibin û dûrî gemarê bikevin û maskan li xwe bikin, heta ku xwe ji vê vayrosê biparêzin.


# Barzaniyê nemir sembola azadî û berxwedanê

Kurdistan

Barzaniyê nemir , rêberekî miletê Kurd û Kurdistanê yê dîrokî ye ku em bi giramî bibîrbînin. Ew di 14.03.1903an de ji dayikbûye û di roja 01.03.1979an çûye ber dilovanîya xwedê. Ango adara îsal, 116mîn salvegera ji dayikbûna wî û salvegera 40emîn ya wefata wî ye.
Ji roja jidayikbûnê heta wafata wî, jiyana Mele Mustafa Barzanî, kurte çîroka têkoşîna neteweyî ya Kurd û Kurdistanê , ya di sedsala 20an de ye . Jiyana Mele Mustafa Barzanî yê nemir, bi şer, hefs , koçberî, surgun , wêranî û bi trajedîyên mezin ve dagirtî ye. Herweha jiyana M. Mustafa Barzanî, bi xweşî û nexweşîyên xwe, bi serkeftin û şikestinên xwe, bi welatperwerîyê, bi xebat û têkoşîneke bêwestan, bi hêvî, dilsozî û biryardarîyê,bi berxwedanê û bi sekneke bi şexsiyet ve hatîye hûnandin. Melle Mustafa Barzanî di temama jiyana xwe de, tu carî nefsbiçûktî, sebir, tolerans û xweşbînîya xwe ji dest berneda.
Mele Mustafa Barzanî, bi rêbaz û xebat û têkoşîna Şêx Abdulselam Barzanî û Şêx Ahmed Barzanî û di medreseya welatperwerîya wan de perwerde bûye. Rêbaza M. Mustafa Barzanî, berdewamîya rêbaza Rêxistina Azadî ya Xalid Begê Cibrî, ya Xoybûnê, ya Komara Kurdistanê ye. Ew berdewamîya doza Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Seyid Riza, îhsan Nurî , Qazî Mihemed e.
Ew aktor û şahîdê gelek rûdanên dîrokî ye.
Weke Serfermandarê Artêşa Komara Kurdistanê (Komara Mehabadê) di ava kirina Komara Kurdistanê de roleke dîrokî lehîstî ye. Ew damezranêr û Serokê Partîya Demokrat a Kurdistan-Iraqê ye. Mele Mustafa Barzani, piştî hilweşandina Komara Kurdistanê, 11 salan li Yekitiya Sowyetê li gel 500 hevalên xwe yên pêşmerge jiyaneke gelek zehmet derbas kir. Mele Mustafa Barzanî, di sala 1958an de vegerîya Iraqê lê di demeke kurt de, mecbûr ma di sala 1961ê de şoreşa îlonê destpêbike. Di 11ê adara 1970yê de bi hikûmeta Iraqê re peymana otonomîyê îmze kir. Rejîma Beesê şerdên peymanê pêk neanîn. Mele Mustafa Barzanî dîsa di 1974an de dest bi şerê çekdarî kir. Lê di 1975ê de bi Peymana Cezayirê, bi lihevhatina Iraq û Îranê û nevbencîtîya Emerîkayê, Emerîka û Îranê dawî li piştgiriya xwe ya jibo Mele Mustafa Barzanî anîn û şoreşê şikest xwar. Mele Mustafa Barzanî şer rawestand. Vekişîya Îranê. Û di roja 1ê adara 1979ê de jiber nexweşîya xwe çû ber dilovanîya xwedê.
Ala Kurdistanê ya ku Pêşewa Qazî Mihemedî teslîmî Mele Mustafa Barzanî yê nemir kir, tu carî neket erdê. Û ew alaya ku Mele Mustafa Barzanî yê nemir teslîmî pêşmergeyên Kurdistanê kiribû, bi gelek êş û zilm û qetlîaman ve, lê bi têkoşîna pêşmergeyên qehreman li Başûrê Kurdistanê îro bi awayekî serfirazî li ser Parlamentoya Kurdistanê li Hewlêrê li ba dide.
Xebat , têkoşîn, sekin û şexsîyeta Mele Mustafa Barzanî yê nemir îro jî jibo hemû Kurdên cîhanê cîhê rêzê û hêvîyê ye. Mele Mustafa Barzanî, pêşmergeyek bû, serfermandarek bû, rêberek bû, dilsoz û serokek bû. Di qada navneteweyî de cîhekî xwe yê grîng hebû.
Mele Mustafa Barzanî yê nemir serokê partiya xwe , yê miletê xwe, yê welatê xwe bû. Xebat û têkoşîna wî xebat û têkoşîna me ye.
Mele Mustafa Barzanî yê nemir li her çar perçeyên Kurdistanê jî, di dilê her Kurd û Kurdistanîyekî de çavkanîya dilsozî, bawerî, niştimanperwerî, sebir, xebat û rêzdarîyê ye.
Azadî û serxwebûna Kurdistanê dê xelata herî mezin be jibo Barzanîyê nemir. Mihemed Elî dibêje, divê alîgirên Partiya demokrata Kurdistan-Sûriya pebendî rewanê rêbaza Barzanî bin ew rêbaza ku bi sed hezaran şehîd ji bo wê hatie dayîn, ew bi xwe rêbazeke pîroz e û nabe tik es li pêş wê raweste.
Cemîla jî dibêje, nabe kesayetî bibêje ez li ser vê rêbazê dimeşim û di kokê de pransîpên rêbazê cîbicî neke. Ya herî giring di dema niha de rêzgirtina vê rêbaza pîroz û parastina xaka Kurdistanê.



# Plan û karnameyên partiyan ji bo ziman çi ne



Idrîs Hiso

Roja 21 Reşemehê ji her salekê Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê ye, miletên cîhanê di vê rojê de çalakiyên corbicor derbarê zimanê dayikê saz dikin, ji semînar, konfiras û kongireyên zanstî ..hd.
Di van çalakiyan de, zana, wêjevan, zimanzan û rêxstinên miletan li ser kêşe û pilanên parastina zimanê xwe diwestin û karnameyên xwe datînin ber dest da ku li ser kar bikin û kêşeyên zimanê xwe çareser bikin, zimanê xwe pêşbixin û geş bikin.
Ji bo miletên ku heta niha azadiya xwe bidestnexistine û welatê xwe ji bin nîrê dagîrkeriyê rizgar nekirine, ziman fakterê serkî yê parastina wan miletan e.
Zimanê Kurdî mîna rewşa gelê Kurd di rewşeke xirab de ye, heta niha ji bilî Başûrê Kurdistanê li ti devereke din danpêdan bi Zimanê Kurdî nîne, ne tenê wisa, li her yek ji Tirkiyê, Îran û Sûriyê ku her yek ji van welatan beşekî Kurdistanê dagîr kiriye, tê qedexe kirin.
Lê cihê şanaziyê ye ku, tevî hemû siyasetên hovane li dijî, ziman, çand û hebûna Kurdan bi xwe, Kurdan dikarîbû zimanê xwe, û hebûna xwe li ser axa welatê xwe biparêze.
Di vê mijarê de û bi boneya Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê min xwest ez li ser pilan û karnameyên hêzên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê derbarê geşepêdan, pêşxistin û parastina Zimanê Kurdî binvîsim.
Ji bo vê armancê min du pirsiyar arasteyî hejmarek ji partî û tevgerên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê kir.
Pirsên ku min arasteyî wan kirin bi vî şêweyî bû:

Silav û rêz
Roja 21.02 ji her salê Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê ye...ez mijarekê li ser rewşa Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê amade dikim. vêja ez dê du pirsan arasteyî we (navê tevger, an partiyê hatiye nivisandin) bikim...... bi hêvî me hûn bersiva min bidin li gel spasî û rêz ........
1-Pilan û karnameyên partiya we ji bo geşepêdan, pêşxistin û parastina Zimanê Kurdî çi ne?
2- Heger biryara siyasî û danpêdan bi Zimanê Kurdî li Sûriyê bû, çi amadekariyên we ji bo vê yekê hene?
Spas
Partî û hêzên ku min ev pirsiyar arasteyî wan kirin ev bûn:
1-Partiya Dokrat a Kurdistanê – Sûriya (PDK-S)
2-Partiya Pêşverû ya Demokrat a Kurdî li Sûriyê (Pêşverû)
3-Partiya Demokarat a Kurdî li Sûriyê (ELPARTÎ) baskê Behcet Beşîr.
4-Partiya Yekîtî ya Kurdistanî (Fesla Yûsif)
5-Şepêla Pêşroja ya Kurdî li Sûriyê
6-Partiya Wekhevî ya Demokrat a Kurdî li Sûriyê
7-Partiya Yekîtî ya Kurdistanî (Silêman Oso)
8-Partiya Niştimanî ya Demokrat a Kurdî li Sûriyê (Tahir Sifûk)
9-Tevgera Çaksazî ya Kurdî li Sûriyê (Fêsel Yûsif)
Wate, min pirsên xwe arasteyî partiyên ku niha ti desthilat di destê wan de li Rojavayê Kurdistanê nîn e, û kêm zêde wek opozisyon têne hesibandin kir. Bi mebesta ku welatî, rewşnbîr, nivîskar û hemû çînên civata Kurdî ku xwedan berjewendiya rasteqîne ne ji vê mijarê, karname û pilanên van partiyan nas bikin.
Min pirsên xwe berî bêhtir ji heftiyekê ji destpêka nivîsa vê mijarê arasteyî partiyên navborî kir, piştî derbasbûna bêhtir ji heftiyekê bi tenê sê partiyan bersiva min da.
Partiya Yekîtî ya Kurdistanî (Silêman Oso), Partiya Pêşverû û Partiya Elpartî (Behcet Beşîr). Partiya Yekîtî li ser zimanê sekreterê xwe Silêman Oso, Partiya Pêşverû li ser zimanê Komîta Navendî û Elpartî li ser zimanê endamê polîtbîroya xwe Ebdo Hebeş bersiv dan.
Di bersivên her sê partiyan de bi tenê gotinên giştî, derbarê girîngiya ziman, di hebûn û parastina hebûna gelê me de hatin gotin, mirov nikare pilan û karnameyan bibîne, bi tenê çend pêngav hene ku di hindirê partiyan de têne avêtin mîna ferzkirina fêrbûna xwendin û nivisandina bi Kurdî.
Partiya Elpartî di bersiva xwe de behsa hin mercan dike li ser wan kesên ku dixwazin bibin hevalê partiya wan, ji wan jî divê fêrî xwendin û nivîsa bi Kurdî bibin, herwiha behsa belavbûna belavoka Elhizib a bi Zimanê Kurdî dike, lê ti pilanekê destnîşankirî nade xuyakirin.
Bi heman şêweyî Yekîtî di bersiva xwe de behs dike ku ew ji partiyên serekî bûn ku xwedan karên rijd bûn ji bo belavkirin û parastina Zimanê Kurdî, û behsa hin ezmûnên xwe dike, hin pêngavên ku ew dê bikin heger danpêdan bi Zimanê Kurdî bû, lê dîsa jî mirov dizane ku ti pilaneke dukmen nîne û mijara ziman nebûye mijarek sereke ji mijarên xebata partiyê, tevî ku Partiya Yekîtî di mêjûya xebata xwe de hejmarek karên berbiçav kiriye û mirov nikare çavên xwe ji wan karan bigre.
Di bersiva Pêşverû ku li ser zimanê Komîteya Navendî ya wê partiyê hatiye, pêngavên xwe di piştevaniya nivîskarên Kurd ku bi Kurdî dinvîsînin, û handana yên din ji bo ku bi Kurdî binvîsînin, herwiha behsa wê yekê dikin ku pêwîste rênma werin danîn ji bo Kurdî bibe zimanekî fermî û stander pêkbînin, lê dîsa ti karname, pilan û stratîjî diyar nabe,...hd.
Partiyên din, heta vê gavê ti bersiv jî nedane, tevî ku Şepêla Paşeroj gotibû em dê piştre bersivê bidim, lê Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê hat jî û bersiv ji aliyê wan ve nehat, û heger hat jî em dê piştre amajeyê pê bikin.
Ji bersivên ku ji min re hatin, û ji şêweyê ku bersiv pê hate dan mirov dikare hin encaman bidestbixe.
1-Ti pilaneke darîştî li cem tevger û partiyên Kurdî yên ku min pirsên xwe arasteyî wan kir nîne, bi tenê bîr û baweriyên giştî hene, ku her Kurdek behsa wê dike.
2-Heta niha li cem van partiyan li vê mijarê wek mijareke serekî û stratîjîk ji xebat û têkoşîna gelê me re, ne hatiye nerîn.
3-Di bersiva wan de, diyar dibe ku ti amadekarî nînin berî ku danpêdan bi ziman were kirin, ji ber xuyadibe ku ew dibêjin piştî ku danpêdan bê kirin, ew dê daxwaza vekirina dibistan û zankoyan bikin da ji wan dibistan û zankoyan pspor û zana derbiçin(Bersiva Yekîtî Kurdistanî).
4-Hejmarek ji van partiyan li xwe danayinin ku li pirsa rojnamevanekî Kurd, ku dixwaze pilanên wan bi xwendevanan bide nasîn vegerînin. Lewma piştî derbasbûna derdora mehekê rojan jî wan ti persiv li ser pirsên min nedan, ne bi erênî û ne bi nerênî.
5-Nebersivdana wan partiyan bi tenê wisa tê famkirin ku, ew di vê mijarê de yekcarê bê karname û plan in, û dibe ku vê mijarê girîng jî nabînin, li wê astê ku bersiva pirsên wisa jî nadin.
5-Heger ne ji ked û xebatên kesane li vir û wir ba, ev rêjeya ku bi Kurdî dixwîne û dinivîse wê tineba, ji ber diyare ti pilan û karnameyên diyar li cem van partiyan jibo parastina zimanê Kurdî nîne.
6-Ez wek hemwelatiyekî Kurd, ji daxuyanî, lêdwan û piraniya ragihandina van partiyan têdighêm ku, mijara ziman li cem wan hatiye paşguhxistin û qet girîngî pê nehatiya dan, ji xwe ev yek xweş diyar dibe dema ku hejmara herî mezin ji serkirdeyên rêzên yekem, duyem û sêyem jî dibîne ku nizanin bi Kurdî ne bixwînin û ne binvîsînin.
7-Partiyên navborî û partiyên din jî xwe bi şopînerên damezrênerên yekemîn partiya Kurdî li Sûriyê, mîna Dr, Nûredîn Zaza, Apê Osman Sebrî û Reşîd Hemo...hd dizanin û xwe didin nasîn, lê mixabin îro em dibînin ku zimanê Kurdî bi şêweyekî pir mezin li cem van partiyan hatiye paşguhkirin, tiştê û karên ku damezrênerên yekemîn partî jib o ziman kirine van hemû partiyan nekirine.

Dawî
Metirsiya ku îro li ser Zimanê Kurdî heye, ji metirsiyên berê zaltir e, ji ber berê rêjeya nexwendewariyê bi zimanê fermî ku Erebî ye gelekî di nav Kurdan de kêm bû, lê niha Kurd bi rêjeyeke mezin bi zimanê fermî dizinin bixwînin û binvîsin, û zimanê fermî bûye di her malê de, û bi her kesî re, bi rêya nêt û alavên pêwendiyê yên nûjen, lewma metirsî bêhtir e. beramberî vê metirsiyê jî partî û hêzên Kurdî ji ber vê mijarê bê xem in, û karên ku têne kirin, ku bêhtirên xwe ji aliyê kesayetiyên serbixwe û xemxurên Zimanê xwe ne, têra wê yekê nakin ku metirsî li ser ziman nemîne.
Di vê gotarê de min xwest ku balê bikşnim ser pilan û karnameyên hejmarek ji partiyên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, ew partiyên ku bersiva min dan, ez spasiya wan dikim, ew partiyên ku bersiva min nedan bi hêvîme ku ne bi mebest bersiva min nedabin. Lê ev mehek jî derbas bû hîna ti aliyekî bersiva min nedaye.
Parastin, pêşxistin û geşpêdana zimanê Kurdî hîmê serekî yê doza neteweya Kurd e, hebûna Kurd û Kurdistanê bi man û parastina Ziman dibe, ji ber ziman danê çand, filklor û hemû berhemên gelê me ye, lewma divê bi şêweyekî pilankirî û zanistî li ser vê mijarê kar were kirin.

## Leşkerê Roj sembola berxwedanê

Emel Hesen



Ey pêşmergên Sazkare û Nêçîrvan
Qehremanên qada Mihabad û Koban
Dilsozên Rêbaza Qazî û Barzan
Awazên Zageroz û Korek û Şingal
Sazbendên Cemê Aras. Dijle û Ferat
Serbazên deşit û Çiya û Zozan
Cengevanên Axa Mêdiya û Mîtan
Cangoriyên Şorşa Eylûl û Golan

Ey Leşkerên rojên geran
Alî û Serbaz û Dilovan
Ey Şêr in Welatê Şêrgo û bêkes
Yê şikand Serê Faris û Çerkes
Hat e Newroz û Sersal û bihar
Rahêjin Tifenga Barzan
Rûmeta hebûna Insan
Yê ku dijmin jêdeke hesab

Gel bi we Şanaz û Serfirazin
Kesek, Sor, Zer AştîXwez e
Netewa pîroz xweş Awaz e
Van Sînora tevan rakin
Qyîd û zincîran bişikînin
Dijmenê hov em talankir
Gond û şênî li hev parkir
Ji bin destiyê me rizgarkin

Êdî bese zilm û Zorî
Qêrîna me giheşt jûrî
Kes li me nabe Xwedî
Li vî Zimanê bê Fedî
Ta kengî em bêjin bratî
Bes e kurdo îro roja Yekîtî
Em jî dixwazin bijîn Serbestî
Naxwazim bêjin ta ebd bidestî

## Kurdistan e

Nebîha Hosên

xemila hemî welatan
xaka Pîroz
Kurdistana welatê rojê
Warê hebûnê, cihê .. xêr û bêrê
Warê mêran û egîdan
Ala min ..
Ji hemî alan şêrintire
Keske mina sirûrşte kurdistan ê
Sora ji xwîna şehîdên pekrwan
Zere roka li ezîman ..
Ronî dide cîhan
Sipîye mina dilên paqij tijibûye ji eşqa Kurdistan
Her bilind be ala kurd û kurdistan
Neqşa dewlet û gelê mîtan

Zimanê min ..
Kurdiye
Ji hemî zimanên .. Dûnya yê şêrîntire
Soran , zazan , loran , Goran , kormanc , û bedînan ,
Rengîne wek baxçê kûlîkên serê çîyan
Bi Kurdî ..
stran , nêvîs , axaftin , bî hemî rengên zimanê min .. Xweştir û bedewtire

Kurdu ..
Bêje ezim taca serê hemî gelan
Ezim yê ji dilêmin evîn diwaşe weke baran
Ezim yê gerdûn xemilandî ye bi dil paqjî û hezkirina Jîn û jîyan

Jina kurd ..
Ezim jina kurd ..
Bi aqil û zîrek
şêrînim mîna find
Bûka bedew û pir blind
Xemla min ev dil bi evîn û hêvî
Na têm şikandin tu car û natwim ber bexta cîhanê û ne dijî dûjmin
Ezim taca serê hemî jinên cihanê
Sûnd dixim ezê bimînim her dem bi hêviya kurdistna Azad û bextiwar
Ezim kurdê ser bilind .



## Rewşenbîrî



Narîn Omer

Rewşenbîrî yan ronakbîrî peyveke latîniye û ji çandiniyê hatiye yan jî ji qada kû nahatibe cotkirin û çandin lê ew xakek û qadeke baş e hêjaye ji çandiniyê re, û hiş û mejî û hestên mirov jî wihane dikare raman û tiştên baş têde biçîne
pir pênasînên ji ronakbîriyê hene lê em dikarin li ser peyvên Zanyarê cîhanî Taylor rawestin dema ew rewşenbîriye didenasîn û dibêje:
"(rewşenbîrî ew lêkdana sergihayî e kû zanyariyên xwezayî û efsaneyên zanistî, û ol , û huner, û rewişt, û yasa, û kelepûr, xwe di bin sêwana wê de dicivînin û cih digrin û mirov wekû endamekî civakî wan bi dest tîne".
Ango mirov van agahî û zanyariyan di qad û xaka hiş û mejî û hestên xwede diçîne û piştre li gel û civaka xwe û li tevayî jiyan û cîhanê belav dike.
Çi kesê karibe bi vî karê girîng rabe ew dibe rewşenbîr û em kurd dibêjin ronakbîrî û ronakbîr jî ji ber kû ew mîna mûm û finda ye rêk û pêkên rast û dirust li pêş kes û mirovan vedikê û ronî dikê, û rewşenbîr bixwe piştî westandin û livandina wî ya kûr û dirêj di warê rewşenbîriyê de û xwarin û vexwarina wî ji ji çavkanî û zevîyên wê dibe alava ronahiyê, civak û gerdûnê ronî dike bi zanyarî û zelalbîna hest û ramanên xwe û nezanî û tarîbînê diveşrê û li ser hiş û çavan dide alî û radike.
Rewşenbîr ewe yê ku hişmendiyeke xurt û bi hêz di mejyê wî de tê çandin bi cihkirin, û nêrînên wî ji hemî hêlan ve yên konevanî û ramyarî û çandî û aborî û civakî kûr û dirêj bin û giyanê pakrewaniyê û dilsoziyê vêre xurt be, û bikaribe karê xwe bicih bîne, û bi bûyerên civak û milet ve hatibe girêdan û li pêşya miletê xwe bilive û kar bike, û bi xweşî û nexweşî vî miletî ve pir hatibe girêdan, lewma Lênin gotiye:(Rewşenbîr çavên miletên xwene"

Eger rewşenbîr ne ewe yê kû rewşenbîriyê diafirînê ji ber kû ew berî wî afirandiye lê bê wî rewşenbîrî nîne û ew wê ji warê rawestandinê dike warê livandinê de û giyan û rewan didiyê.
Zanyar Giramşî cudabînê dike navbera rewşenîran de û dibêje yê rast û nerast heye û liwîs kozer dibêje:
Rewşenbîr pêmayên kehene û pêxembera ye û ji erkê wan e kû ew li rastiyê bigerin û wê biparêzin û tiştên pîroz û baş yên ku civak û şaristanyê dişopînin

Û dibêjin:
Ji lewma ne her kes dikarê bibê rewşenbîr û hijmara rewşenbîran li seranser cîhanê û bi taybet di civaka rohelatî te kêmin, û çênabê heg yek ji me bake û bêjê :ez rewşenbêr im yan jî em rewşenbîr in
çend zanyaran gotine ku:
her mirovek rewşenbîr xwendevan e lê ne pêwîste her mirovek rewşenbîr xwendevan be, û ne çi kesê xwendevan û xwediyê bawernamiyên bilind dibe rewşenbîr ji ber kû ew bi alikî tenê ji aliyên zanistiyê ve hatiye girêdan û mebesta wî ji bawernameyên wî kû ew karibe pê bijî û rewşa xwe ya civakî û kesayetî pêkbîne
Rewşenbîrê kurd kiye?
Helbet ew jî yek ji wan rewşenbîrên cîhanî ye û kû divê ew bibê çav û gav ji gelê xwe re û bibê rêberê milet û civakê û riyên rast û pêkhatî li pêş wan deyênê û ronî bikê û bi wan re bê di hemî çax û derfetan de û bi xweşî û nexweşiyan û bibe rexnevan û nirxevanê hişmend û zanyar lê pêwîste ew di nêrînên xwe de serbixwe bimînê û hêzdar bê ku ew ji rastiyê nerevê û li himber hemî şaştyan rewestê û dudilî çara wî nebe û ne drû be
ya herî giring ku ew rihsivik û baş bimîne di dan û standinên xwe bi civak û gel û derdoran re û xwe li ser kesî nebîne û eger bi zanibê gotin û karê wî rastin û wan negihure û ew nebê boq ji vî alî yan ji wî alî re û rexnê li çi tişt û karên çewt û nerast bikê tevlî em dikarin erê bikin ku kesê rewşenbîr û ronakbîr çavdêrê civakê ye û çavên dil û ramanên wî mîna rewangehê ne û civakê û mirovan ji riya çewt divegerînin û berê wan didin riya rastî û xweşiyê.

